

S T Ê R



kovareke çandî gîştîye

HÎJMAR 3

SAL 1983

Pêşgotin

Xwendevarên dilovan!

Em pir kêfxweş û şane bi piştgirtina wê ji kovara xwere-"Stêr". Em xweş dinasin, ku bi vê yekê, ne tenê, hun "Stêr" dixwînin, belavdikin û giranbiha dibînin. Lê wilo jî, bi vê geşbûnê, hun gelek tiştên xweyên folklorî berhevdiikin û diparêzin. Bê goman "Stêr" ev rê girtiye, digre û wê bigre. Ewe riya parastina ziman, folklor, û hemî rengên wêjeyî û çandî û y. d. Wile jî lêkolînên civakî û dîrokî berdewamdike û liser wan radiweste. Ji vê yekê, em dibêjin, "Stêr" kurîh daye (rayên nû berdane) di riya xebata zimannasî û zimanparêziyê de.

"Stêr" dareks nûkate, bo wilo avdan û guhdanê dixwaze. Û ev tişt barê her kesê miletparwer û miletnase. Lewra em dibêjin, ku "Stêr" dengê weye, dengê kevniariya miletê weye, di riya wêjeyî, çandî, zargctinî, folklorî û y. d.

Em xweş dinasin û dibînin, ku gelek deryên kêr di kovara "Stêr" de hene; ji wan: deryê problêmên (muşkle) jinan û yên xortan, deryê zarokan û guhdan û xwedîkirina wan, deryê dîrokî û y. d.

Pêşvebirina "Stêr" û xurtkirin û têrkirina wê liser hevkarîya we bi komîta (licne) kovarêre dimîne. Liser nivîsandin, berhevkirin, lêkolîn û pêkanînen we dimîne.

Bi têrbûna "Stêr", wê tîrêjên ronîya wê dûrtir herin û zûtir tarîstanê ji hev belavbikin, û wê bi xurtî li nav civakê aspîda bidin (tîrêjên roja nûhilatî). Hinga, ewe avdan û guhdana we ji "Stêr" re, da karibe rayên xwe, bi xurtî, di nava zemînde biçîne û bi şax û pelên xwe konê parastina miletê xwe vegire.

"Stêr" bi sîngeke pir fereh biryar, pêşneyar û rexnên xwendevarên xwe werdigre. Ji wan alîkarî, bi hemî rengên xebatê, dixwaze.

Stêr ★

Çiyayê bi xwîné avdayî

Nivîskar: Bavê Nazê

Herdû bê deng man. Sira bayê kur mişênî bi daran xist û ji nûve kate bîra Çeto, ku baqê gulan diyarî Gulê nekir.

-Gula min, ev baqê gulan bo te min dabûhev... û xwest wê bi-ramûse, lê Gulê berê xwe guhert û got:

-Çeto, ez tê nagihim-û xwe bi nermî ji destên wî derxist-na, lê belê ez niha têgiham... Tu dixwazî katê xwe bi minre bibûrî-nî, ne bihtir û tê xwe dinav heval û hogirên xwede payabikî, da nav û dengê min û te bi avîndarî dinav eşîra minde belabibe... Çeto, ji niha û pêve, em pêrgî hev nabin û ez narwazim şerm û sertewandinê bipey eşîra xwe bixim.

-Jibo xwedê, ev çi gedinên pûç û valane tu dibêjî-pêre deng-berziya wî Haket-herê herê Gulê, eger te zanibûna çiqasî ez ji te hezdikim... Sertewandina te, ya mine jî... Ez dizanim, ku nexwe-şiyê bo te peydadikim-meyzand, ku va Gulê hêstiran bê dengî di-barîne, higî herdu destên wê jiber rûçkên wê hilandin û di guhê wêda got:

Guleka min, emê herdem pêrgî hev bibin û hev bibînin. Eger gerekî çêbû, ezê çiya bo te bikim dest. Gula min, hevkirin her riya meye

Bi dîlberî herdu destên wê girtin û bi ramûsanên nerm û pir bi germî û evîndarî ji wan kir û pêre li demên dûrî dinerî. Gulê di awirên çavên wîre rastî, xemgînî û tiştêkî din, bê ku nasbike dîtin.

-Çeto, baweriyê bi te tînim-Gulê wilo got û pêre destê xwe kişand, da hêstirên xwe paqij bike. Belê ez baweriyê bi te tînim, lê tu zane, ku ez xwestiya kurmamê xweme. Û ev bihtir koregirêkan li dan û sitandinên me girêdide û zor dike. Ez digihime te bîser, ku dijminatî dinav herdu eşîrên mede heye, ji ber ku ez pir ji te hezdikim û tiştêk di jiyanêde hemparî wê hezkirîné nabe... Xwedîo, ez çi jar û kuçguherî me... Çima xwedê em kirin dijminê hev? Û ji nûve dest bi girî kir.

Paşî axîneke kûr û bi şewat Çeto got:

-Dîlbera min, em ne dijminê hevîn, ma kê ji tere got em dijminê hevîn? Ev tiştên, ku tu dibîne bi destên beg û axan hatine danîn û çêkirin, wekû bê goman wê rojek bê, ku aştî perê xwe berde ser lat û zinarên me, weku mamostê me Siyamend dibêje-di bihçinên rûyê wîre jarî û xemgîniyek kûr û dijwar dihat xuyakirin, weku yekî tiştêkî tal û nexweş hatibe bîra wî-belê, wê ew roj bê, lê kengî? Ez nizanim. Serê xwe rakir û kûr-û dûr li hevbirîna xak û esman nerî.

-Belê Çeto, ez bi evîndariya xwe jar û mestim. Ez dinava xwede dikelim, gava ku şahiya dilê xwe nikarim bidim der, ne ji diya xwera ne ji heval û hogirên xwera. Dinav herde tev bi serbestî û kêf û şahî, liser dildar û evîndarên xwe dipeyivin, tanî liser te jî.

-Liser min? Çi liser min dibêjin?... Çeto bi çilekî pirsî.

-Dibêjin ku tu ne wek tu kesî ye.

-Bi çî xwe ez ne wek tu kesî me? Çeto bi heyr pirsî. Bi rengê xwe, bi gewd û dîrên xwe, yan bi dan û sitandinên xwe, yan jî bi tevger û lebata xwe?

-Bi hortîştî. Dibêjin ku tu xortekî bê hevalî û tenîtiyê di-xwazê, tu her ji tevheviya xortên gund nakê, û tanî dûrî keçikên eşîra xwe dikevi, û dûrî tevreqûnk û bûyerên gund dikeve, bi tenha xwe dimegê weku yekî tiştêkî xwe winda kiribê û lê bigere.. Lê kal û pîrên gund dibêjin, ku tu kesekî bê ol û xwedê nenasî, û dîniya te jî kesan-tirs dinasin.

-Çi dîtir? Çeto bi dilsozî pirsî.

-Bi rastî pir liser te nizanin. Ez jî tiştêkî liser te nizanim? Jiber ev tenê çend heyvên we, ku hun hatine gundê me.

-Ez bi wanre nagerim, jiber ku wan nanasim-Çeto bersiv da-ma çî qezenc jî tevreqûnk û cenga bi gundiyanre heye? Ma jî bo çî? Bi rastî, gundê weke zîndanêke mezin û gewreye bo me, tanî jî zîndanê jî xirabtire, eger min tu nasnekira-û lîvên wî bi şahî jî serhevzabûn gava hevoka dawî got-.

Gulê kêf û şahiya xwe veşart û neda diyarkirin gava jî wî pirsî:

-Eger gundê me, jî were weke zîndanêye bo çî hun hatin?

-Gulê gundên me tev wek hevîn û wilo jî gelên wan-ev got û ma nedeykirî.

-A...min jibîrker bêm, çawa gundî dibêjin ku tu ateystî, jiber ku te di dibistanêde xwendîye. Ma raste-ku di dibistanêde we fêrî zanistiyên ehreminî dikin? Tu jî fêrî wan bûye?

Çeto keserek kişand û got:

-Belê, ez ketim dibistanê, lê fêrî zanistiyên ehreminî nebûm. Ev, tenha, gotinên began, axan, melan û berdevokên wane-hinekî ma bê deng û bi xemgînî di-se got-bidaxewa ku min nikarîbû xwendîna xwe bibim dawî, û weke henîyan mame nezan.

Gulê gotina wî birî û biberazî got:

-Lê min, spas bo çana xwedê, Quran xwend. Spas jî xwedêre, ku te xwendina xwe nebî serî, lê tu jî weke kesên şar û bajaran bûbûna xemborî.

Kovavî û xemgînî xweş di rûçikên Çetode diyarbûn gava got:

-Bê goman, eger xwendin û çî tiştên din ber bi min anîbûna, wê daxwaza min xwendin bûna.

-Te yê xwendin ji min jî çaktir bidîta?-Gulê bi terqedil pirsî.

-Na,ezî we herduwan bixwazim.Çeto bi devliken bersivda.

-Eger te wa ji dibistanê hezdikir,bo te dev ji wê berda?-Dil-behitî pirsî.

-Min bi xweşî dev ji dibistanêⁿberda,lê li min barbû gava mala me ji gund barkir.

-A...te anî bîra min.Çima we mala xwe ji gund barkir?

-Ev serpêhatiyek dirêje-Çeto got û bi kûrî bihna xwe kişand.

-Tu hertiştî liser min zanê,lê ez tişteki liser te nizanîm?

Ez dixwazim tu liser xwe ji minre bibeyivê-Gulê bi hêvîdarî got.

Çeto qotiya titinê ji berîka xwe derxist û çixarek pêça.Çixara xwe pêxist û mizek jê da.Dû berda û dinavre,li esman dinêrî. Esman,weke her havîn paqij û xam bû.

Gundê me jî weke hemî gundan bû,lê ji gundên vê deştê tevan dibistan tenha li gundê me hebû.Ew dibistan bi saya serê mamosta Siyamend hatibû avakirin û deryên xwe ji suxteyên gundre vekiribû.Dibêjin ku berî niha malî û merivên Siyamend li gundê me dijîn,lê jiber tiştan dev ji gund berdan û çûn bajêr.Li wir Siyamend xwend û danîşgeha mamostabûnê bire serî.Bi zanîn û jîrbûna xwe doza avakirina dibistana gund xiste serê gundiyan û karîbû,li bajêr bi komarêve girêdayî,dozbike û bibe serî.Wî avakir û bû mamostê pêşî û dawî...Çeto ma bê deng,da hilmekê li çixara xwe bide,lê nerî ku vemirtiye,hingê avête dûr û gotina xwe bire serî: Weke niha li bîra mine,çawa bi ghiştina mamosta Siyamendre deng li gund tevî belav bû û me zarokan,bilez û bez berê xwe da wî kaniyê,ku digotinê"dibistana gund".Li wir komek kes û gelên gund li dor û madarên mamosta civîbûn.Min xwe dinav wan rakir û xwe gihand nêzikî mamosta,tanî ez hingivîm berdîlka wî.Hinga,min xwe bi vê yekê liber heval û hogirên xwe paya dikir.

-Min ticaran mamosta nedîne...Ew çawanin?Ma wek melane?Gulê hişbider dipirsî.

-Na...Ew jî weke her mirovane,lê ji wan cudane bi qilix û to-siniya xwe,bi gotinên xwe yên xweş û nerm,û bi zanîn û nasinên xwe yên fereh.Çeto bersivda û pêde çû....

Di roja duhêde ji hatina wî,derket û mal bi mal,li nav gundiyan geriya û ji mezinan dixwest,ku zarokên xwe rêkin dibistanê. Bi bihn ferehî,zanebûn û qendîtî gundî dixistin kirasê pêkanîna vê daxwaziyê.Pirê gundiyan daxwaza wî bi cî anîn,lê dijî şiyandina keçan westan,û hemî karên mamosta Siyamend di vê riyêde vala çûn.Ez jî yek ji wan zarokên,ku rêkirin dibistanê bûm.Çeto dît çawa Gulê bi guhpêlî dibihîze,pêde çû û gôt:

-Hinga,mamosta Siyamend Bîst û pênc salîbû,qor û laxer bû,eni

bilind bû, xwediyê du çavên pêşnerin bû, çek paqij bû, kenê xemgîni herdem liser dev û lêvan bû, û biser aramîtiya wêde rûniştin bi wîre û civata wî pir xweştû. Zanibû çî dixwaze û çî dibêje. Gava hişkati pêwîst bû, hinekî hişkbû.

Hîna li bira mine û liber çavên mine-weke duh bû-katê der-rasbû oda suxtan. Em tev jiber wî rabûn û gava em rûnandin, xwe bi me da nasîn: Navê min Siyamende. Ji îro pêde ezê we fêrî xwendin û nivîsandinê bikim.... Hêvidarim, ku hun tev suxtene jir û zanabin, zû-bi zû fêrbibin û jêxwestinên xwe bi başî pêkbinin, tanî ez karîbim serê xwe bi we rakim û bilind bikim. Paşî vê pêşgotina kurt dest bi pirsîyariya navên me kir û di tînivîseke ferehde nivîsandin û gava doza "Lezgin" hat-kurê jinbira cîranê me-, ew jî direx minde rûniştibû, mamosta ew pêxwas dit û pirsî: Çima tu wa pêxwasî? Lezgin bersiv da û got: Ev bû sê roj, çawa bavê min nemra lingê min bire ji mişqare, lê hîna bizmarên wê dinav avêdene, da nerî bibin. Kengî çêbûn ezê bi pêlav bêm dibistanê. Pê êşan di rûyê mamostre xuyakir, hînga ji wîre got: Başê! Lezgin "paşî du rojan were cem min hundur. Paşê ji min pirsî: Navê te çiye, xorto? Gava min bersiva wî da, got: Tu wata navê xwe zame? Min bi nizanî bersivda. Hînga wî ji minre got: Wê rojek bê, ku tu wata navê xwe nasbikê.... Çeto livir westa û xemgîni li wî diyarbû, paşê pêde çû:

Paşî nayên me tevan nivîsandin got: Gelî dilovanan, liser min pêwîste, ku ez bi zarê dibistanê bidim û bistînim û ev ne weke zarê weye, yan jî ne weke zarê meye... û jiber ku tanî niha hun vî zarî nizanin, pêwîste hun fêrî bibin. Hînga me nepirsî semed jî vê yekê çiye, jiber em bawerbûn, ku li herderê du zar hene: Yek zarê malêye, yek jî zarê dibistanêye. Mamosta, dest bi nivîsandina tîpin bêgan û nenas liser reşokê kir, yên ku me ne bi nivîsandin û ne bi deng nikarîbû ji hev binasin, bo wilo wî li pêşiya me digot, û me divegerand. Roj derbasbûn û em jî bi xwendinêda diçûn, tanî me dest bi xwendina wan tilismên, ku rojekî ji rojan zor û raz didin û me hin bi hin gotin naskirin û.... Gulê gotina wî birî:

-Ma ew tîp weke yên Quranê bûn?

-Çeto Bi kurtî bersivda. Na.

-Ma fêrbûna wan jî weke yên Quranêye? Ji mere digotin, ku kesê fêrî Quranê bibê û bi giştî bixwîne, weke birekê bi derziyê bikole.

-Bo me herdu ziman zor û giranin, jiber herdu ziman jî ne yên dê û bavane-Çeto bersivda û bi gotina xwede çû:

-Min ticaran bawer nedikir, ku rojekê ji rojan bi zimanê Tirkî bixwînim û binivîsim, lê ez jî-weke hemî hevayên din-bi saya kar

û barê mamostayê xwe, fêrbûm. Bi saya wî kesê, ku hemî zor û zehmetî roxandin. Bi rastî ne bi tenha em zarok fêrkirin û jîr û zanakirin, lê wîlo jî kesên mezin û bi temen. Ji vê yekê dan û sitandinên gundiyan bi rengekî nû hatin danîn û ew berberîti û dijminatî hatin hilanîn û şûna wan xweşî û goşî şin bû. Paşî min naskir, ku wî gundî bi riyên çîni û netewî didan nasîn, û jî vê yekê axa jî wî hat pingandin, bo wîlo dest bi nîq û derewan li ser mamosta kir, û di rîya kole û nokerên xwera û kesên dora xwera belavkirin. Û katê naskir, ku ev piş û wîlikên wî tişteki nadin, dest bi dav û torên pîstir kir.

Rojekê, jî gundê dora xwe, zaroyên Hesko xwestin cem xwe û biser wan rabû, gotinên renga-reng dane rû wan û bi qelsîti, tirs û bêziravî pesin dan. Gava wan pirsî, çima wîlo jî wanre dibêje. Bersiva wan da: Çawa hun, dinav dost û dijminande, karin serê xwe rakin û dijminê we cirîda dinav wede dide....?? Ma hun nizanin, ku Siyamend neviyê Hemreşkêye, yê ku kalkê we kuşt?! Raste, bayê we nikaribû heyfa xwe hilîne û bi dest wîve nehat, lê hun bendariya çine? Ma bila dijminê we serbest û bê tirs bigere?

Mihêk diser vê civînêve derbasbû gava hersê kurên Hesko hatin cem mamosta Siyamend? Hatina wan paşî nimêja êvarê bû û lê hat, ku ew bi tenha xwe lioda xwe bû di dibistanêde-weku, paşê, birakî bi zimanê xwe got. Mamosta Siyamend liber wan ket û rabû û bi rûgeşî liber wan çû û hat û got: Ez pir bi hatina we şame û dilxweşiya min bihtire, jiber ku we dev jî dembarên dêrîn û kevnare berdaye... Bi rastî, li min pêwîst bû hatina ba we, lê rewşa ez têde rê nedâ min... Bi hatina xwe, we barekî pir giran jî ser milên min rakir. Hatina we destpêka xêr û xweşiyê û dan û sitandinên muhe, di çiyayên mede. Roja aştiyê vaye hat, da şaxên xwe berde ser Kurdistana me û hezkirin û biratiyê dinav mede belavbike. Hingê jî wan xwest, ku çayê jî wanre çêke û bîne, da bihtir li hev rûnin û di şahiya hatina wande pirtir bi mîne. Katê nû, mamosta piştî xwe da wan, birayê mezin demança xwe kişand û li ser danî. Pêşî milê mamosta, yê çepê birîn bû. Mamosta xwest bizivire û berê xwe bide wan, weke yekî bixwaze gazina bike, lê herdu birayêr din rê nedane wî û ew dinav berên du cerçûlunde pêçan û laşê wî kirin serad. Mamosta wê gavê ket û dinav xwîna xwede gevizî tanî can da, lêvên Çeto ziz bûn û xwîsiya xwe bi zor qurtand û bi melûlî got: Paşî vê yekê hersiyan rê girtin û revîn. Gulê nema xwe girt, zengelora wê hate hev, lêvên wê jî ziz bûn û çavên wê tijî hêstir û girî bûn. Çeto jî xwest bi zor wan herdu hêstirên xwe berdan nav mijankên wî bigire, lê jî dest derket û xwe berdan ser hinarkên rûyê wî. Herdu mane bê deng, tanî Çeto gotina xwe, paşî kêlikê bir serî û got:

Bersivdan

Nivîskar:Aro

Destên min xistin qeyd û zincîran û herdu cendirmên xwedê neras bi kulmîstan, bi qûntaxên tivingan û yekcaran bi xesan (pîhînên dewarkî), ez di deryê zîndanêve derxistim-gotina xwe berdewamkir-. Ez li rewşa xwe, di wê zîdana kûr û tarî û hêwayîde, venagerim.... Lê belê, agêr bikeve mala wan... Xanikên wan biser wande bikevin... Bi zarokên xwe kêfxweş û şa nebin. Ne xwezaya min bi wê gava, ku berê min dane wê oda bersivdanê!!

Bila tiştên wilo gawir bi çavên serê xwe nebînin!!... Bila hovên serê çiyar nekevin wê tengezarî û dîlîtîyêde!!!... Bila masiyên binê avan, ji tihna bibirîjin û wê jîdestxweçûnê nebînin!!!. Zîndan.... lêdan.... tarîstan.... birçîbûn.... tîbûn... ji hişçûn.... êş.... kul.... û derd tev liber çavên min dihatin, bi min xweşbûn û barê min bûn. Lê, û dîsa lê!!!, lê ew oda bersivdanê ... rengê herdu cendirmên bi kîn. weke du gurên dev bi xwîn... herdugwîzikê çavên wî serokî, yê weke du perengên sor ji vexwarinê... ew destên hişk û giran weke qurmikê darên berûwa... ew botên kabîk bizmar, bi toq û nal û hesin ticaran ji ber çavên min wînda nabin!!... Ta axê bidin ser gorna min, kulê wan ji dilê min dernakevin!!..

Yekî ji wan derî vekir, yê din bi cezma lingê rastê, ez avêtim hundirê "oda bersivdanê". Bi dev û lêvanve, bi herdu destên di qeyd û zincîrande, ez çûme xwar, weke kevoka ji hêlîna xwe bikeve... Min serê xwe rakir, lê lingekî giran ew dîsa daxist. Hingî hêrsan ez girtim, lê ez çî bikimîdestgirêdayîbûm, ji kar ketîbûm... tayên sar û germ, xwe berdand çerg û hinavên min û dinava xwedê dikelim... wan gawiran ez ji karxistim!!... Ax, ji karxistin û bêqarbûn çî zor û giranin!! Kela dil û cergê min tenê bi girî û hêstirbarandinê vedişkest!... Nebêjin, ku ez ji tîrsa wan digirim!... Na, ne giriyê hêviyêbû, ne yê gaziyebû û ne yê bextavêtinêbû. Hûntev xwişk û birayên minin-kesereke kûr bi gotina xwere kişand û pêde çû.... Hingî ez girîm gava bi hiş xwe hatim... gava min xwe di xwîn û gemara şilde dît.. gava qolinc û êşa dîlîtîyê bi movikên laşê minde, bi serbestî, dimeşin... gava min nasî, ku xwîna wan gemaran tevî xwîna min bûye....!!!.

+ + +

Kuxikeke kûr û giran û ziwa, ji kezebê, ew girt û rê nedayê, ku serpêhatiya xwe bibe serî... Kuxikê bi neperûşkên zîdanê kezeba wê dixepart. Dismalka sipî ji paşla xwe derxist û da ber devê xwe, lê hîna ji hinavan weke pelê çilo diheja. Çavên

civatê tevî ji awirên wê dişikestîn û ne barê hilgirtina rawşa wê bûn.

Belxema xwe, dinav dismalkêde valakir û li qetîtkê kezeba xwe nerî...awirên kesê dora wê tîrên xwe li paçikê di destande rastkirin û hinga daxistin gava desmalka xwe pêça û xiste bin kenarê kulêvde û bi destê xwe, yê zer û zirav û bêhêz teptipand.

Toza kulêv bi giranî xwe hilda, lê zû bi zû li şûna xwe vege- ra, da parçên kezeba birîndar bi saxî bitemirîne, da tenê hêviyên jiyan û xebata xwedî himînin ew awirên çavên melûl.

Dawî

+ + + + +

Kurd û nêçîra kewan

Kurdistan welatê çiyayên asêye. Li kurdistanê newal, geliyên kûr, zinarên bilind, dar û devî, rûbarên fereh, dehl û mêrg û deşt hene. Di kembêza vê siruştê bedewde, gelek texlîtên tilûr û cinawiran xwe diparêzin. Yek ji tilûrên kurdistanê yê herî bedew kewe. Kew li bilindcihên hînik dijîn.

Nêçîr ligel kurdên çiyayî adete. Mirov eger ne nêçîrvanbe, kêmasiyeke mezine. Nêçîra kewan xeynî hemû texlîtê nêçîrêye, ew hunerekî bi serê xweye.

Hersal destpêka sibatê çaxê vedana kewaye. Hingî kewgêr kewê ribat li erdê diveve, û hawîrdorê wî davan datîne. Hejmara davan carna digehe 50 - 60 davî, tev bi şelîtan bihevduve girêdayîne. Kewê din, kewê serdar, raserî kewê ribat li serê darekê dixwîne. Dama vedanê kew refîn. Refên kewan li xwendina kewê serdar tîn, û dirêjî kewê Ribat dibin, û li davan taliqin. Kewgêr êdî ji kozîkê derdikeve bi nêçîra xweve. Wisa, bi vî rengî kewgêr ji cihekî xwe diguhêze cihekî din, ku nêçîr lê hebe. Sibat xatîran dixwaze, û kew ji serrefan dikevin, dibin cotik. Her ke- wek mêkewekê digre. Hingî bi cot, yan jî tek-teka xwe davêjin davan.

Kengî mêkewê hêk danîn, hingî dawîya vedana kewa tê. Hejmara hêkan earna digehe bîstan. Hêlîna mêkewê dinava latandeye.

Çaxê mêkew liser hêkan rûdine, û kew bi serê xwe dimîne, nê- çîrvan mêkewê datîne serê darekê, û di kozîkêde divekeve, û çî wextê kew tê, ew bi tivingê davêjiyê. Nêçîr bi vî awayî ta da- wiya nîsanê domdike. Nîsan xelas dibe, mêkew bi refên çelkewanre, diçin ser avzêmkar, yan jî berêvarê vedgerin lîs, da liqayî (rastî) nêçîrvanên bi çifte bîn. Zivîstanê kew şevan di navsera çiyêde, di berihande xwe vedşêrin, û bi şej diçêrin. Çêriya wan pirpirîk, kêzik û zixurîn.

Çaxê erd berf digra, du yan sê gund derdikevine çiyê hêla kewan.
 Hingî kew bi firê hêlê xela nake û dikeve. Nêçîr hingî pir hesani-
 ye. Yan jî eger mirovekî şepa kew di, lipey diçe ta bibîne. Eger ke-
 sekî din jî kew bigre, kew dimîne yê wiyê şop naskirî. Mirovê bihti-
 rî kewekî bigre, gereke bide wiyê nêçîr nekirî, da destevala nevegere
 malê. Herweku li çiyayên asê hêl nabe, kew jî deşt û zozan dikin, lew-
 re dema kew havîna diçine berbi zozanên hînik, li botan di riya wan
 de çalikan çêdikin. Raserî çalikan textik hene, gava kew liser wan
 raxo, diçin. Aqulibin û kew dimênine di çalanda. Çalik jî mîlkin.

Keyn jî van awayên nêçîra kewan, pir awayên din hene, mîna nêçîra
 bi kulfa çilo. Nêçîra bi kulfa çilo û têxe biwara xwe, û çî ga-
 va kew nêzik dibe, ew tivingê diberdiyê. Yan jî dibe nêçîrwan çîtê
 raxo. Liser çîtê sûretê kewan û gelek textlîtên teyrikanheye, kew lê
 dimîne şaş û tê nêzikhatin. Di nîvê çîtê kilorek heye, tere nêçîrwan
 kew dilîne û tivingê diberdiyê.

Kurd dibêjin "kew dijminê serê xweye". Bawerim ev gotina pêşiyar
 neraste, ya rast "mirov dijminê serê kewe û hemû textlîtê tilûran".
 Kewek eger nêxwêna, yan jî kêr bixwêna, xwedî dibêje "bikêr nayê".
 Xwezî bi roja em tev birbibin, ku dar û devî, kanî, teyr û tilûrên
 welatê me, zangînî û bedewiya wîne.

Ji devê kalmêrekî kurd hatiye
 girtin.

+ + + + +
 Her hina

Hey hine hine hina
 Hey hine hine hina
 Hinekê di teştekîn
 Delalê di teştekîn
 Lî destê bûk û zavêkin
 Lî destê bûk û zavêkin
 Dûvre li destê xelkêkin
 Dûvre li destê xelkêkin
 Hine ji hina mûsilê
 Hine ji hina mûsilê
 Min kirî bi elba silê
 Min kirî bi elba silê
 Têra destê sorgulê
 Têra destê sorgulê
 Her hine hine hina
 Her hine hine hina
 Hine ji hina Hecêye

Hine ji hina Hecêyo
 Min kirî bi elbêyo
 Min kirî bi elbêyo
 Têra destê geûrêyo
 Têra destê geûrêyo
 Her hine hine hina
 Her hine hine hina
 Hine ji hina dyarbekir
 Hine ji hina dyarbekir
 Min kirî bi elbek şekir
 Min kirî bi elbek şekir
 Têra destekî nekir
 Têra destekî nekir
 Her hine hine hina
 Her hine hine hina

Hey heval heval hevalê
 Hey heval heval hevalê
 Geurê bozê çav xizalê
 Geurê bozê çav xizalê
 Te xirakir alyê malê
 Te xirakir alyê malê
 Nebin hevala min nebin
 Nebin hevala min nebin
 İşev ûnê li mala mebin
 İşev ûnê li mala mebin
 Sibe ûnê li extra xwebin
 Sibe ûnê li oxra xwebin
 Hey heval heval hevalê
 Hey heval heval hevalê
 Qirka bûkê sor û sipye
 Qirka bûkê sor û sipye
 Tişî mircan û morye
 Tişî mircan û morye
 Hey heval heval hevalê
 Hey heval heval hevalê
 Xwikam rabe rabe tûye
 Daykam rabe rabe tûye
 Ciya te doşek hilanye
 Ciya te doşek hilanye
 Derzya zêr zêr tê de ditye
 Derzya zêr zêr tê de ditye
 Hêstrê çava baranye
 Hêstrê çava baranye
 Keçik birna xerîbya
 Kwşik birna xerîbya
 Hey heval heval hevalê
 Geurê bozê çav xezalê
 İşev ûnê li mala mebin
 Sibe ûnê li extra xwebin
 Hey felekê hey xayê
 Hey felekê hey xayê
 Tu liser keski nadeûminê
 Destê hevalê gutkirim
 Destê hevalê gutkirim

İlmê tûrik

Berhevkirina Bilûrwan

Carekê yekî xwest, ku bibe mela. Rabû, çû cem seydayekî û liber destê wî sê-çar salan feqetikir, ta ku ilmê dîmî tewakir. Ew jî bû mela. Rabû, xatir jî seydayê xwe xwest û xwest, ku here. Lê seyde gatiyê:

-Hêjî bimêne, da tu ilmê tûrik jî tewabiki!

Gotina seyde nekete serê wî û çû. Çû, çû geha gundekî. Gelekî bi rêde çûbû, westabû û çaxê nimêjê bû. Berê xwe da mizgefta gund û bi nimêjvaniyanre nimêjkir û dea jî xwera kir. Li pêşiya nimêjvaniyan şaxekî şaxik mezin û rihdirêj nimêjdikir. Piştî nimêjê şex dest bi waza kir û xwendina ayetê quranê. Ji gundiyanre tefsir dikir, lê çî tefsîr, hemû şax û tevlihev. Melê naskir, ku ev şaxekî bi deruyaye, lê guh kerkirin, deynekir. Dawî şex ayetek xwend û got, ku ev ayet jî sûretê golike. Êdî melê xwe nema girt û dengê xwe kir, got ku ti sûretê golik di quranêde nînin, lê sûretê çêlekê heye.

Çavê şex di qafê serê wîde sêrbûn, kef bi dor devê wî ket û got:

-Bi ocaxa bavê min tu bûyî gawir, mirina te weke ya kûçikekî helale!

Çaxê ev gotin jî devê şex pekî, gundî bi melê harbûn, bi dar û kopal û kevir ew jî gund pîs-pîs biderkirin.

Melayê bê çare berê xwe da cem seydayê xwe û hat, got:

-Ez hatime ilmê tûrik bixwênim.

Rûnişt, sê-çar salan ilmê tûrik jî xwend. Xatir jî seyde xwest û çû. Çû, çû dîse li gundê gonê rasthat. Çû mizgeftê, nimêja xwe li pey şex bi nimêjvaniyanre kir.

Hema, ku şex nimêj tewakir mela jî çih rabû, xwe çendkire riha şex, mûyek jî riha wî jêkir û bi dengekî bilind got:

-Bi ocaxa şex, yê ku mûyekî jî riha şex liber xwe bişewitêne, deriyê cinetê xwedê wê jêre veke.

Hema, ku mela ev got, gundî harbûn û hatine şex. Ta tu çavê xwe levxe, mûyek bi riha şaxve nema.

Melê tûrikê xwe da, ser milê xwe, da ser riya xwe û çû.

+ + + + +
+ + +
+

Zanîna kalan

III

Pêkanîna:Rezo

Payîz:"Ez bi kul û êşim!Ez xemkêşim!Ez didim û ez dipêjim!".
Bi vê getina kûr û dûr payiz destpêka xwe dide nasîn.Ne dûre,ku
nifşê niha vê getinê nasneke û tânegihe!Ji me kalan,ange kevnar-
ran,tê xwestin,ku zanîn û serpêhatiyên xwe bidin nasîn û pêş we
bikin,lê liser we dimîne,....Kalo hilmeke kûr kişand û gttin gu-
hert.

Herdu mihên payizê,yên pêşî,gelek xweşin.Hemberê avdar û co-
tanêne.Di wande terwende,li malê xwe,digihin,şînî çêdibe,mih û
bizin gondixun û berêvarên wê dibin bingehên ger û nêçîran-ewe
"Ez didim".Miha dawî ji payizê-bi zordestîye,nexweşiyê digihîne
şînî,terwendan û pembû.Qeşa wê û qira wê jinişkave dikevin-eye
gava dibêje:"Ez dipêjim".Pijandin(şewitandin)ne tenha bi agire,
lê ji destê qir û serma zor ji pêktê.

Payiz bi êşe,bi mêşe,bi ba û bablîsokê,bi baran û tinazokê .
Êş û birînên payizê zû bi zû na axifin(saxnabin),lewre ji birî-
na,ku zû neaxife dibêjin:"Ma bû birîna nayizê!".Mêş û kelmêşên
payizê jî xwe davêjin hunduran,jiber ba.û serma derve.Cira wan
pir nexweşe-xwe pelûdikin,xwe linav çavên mirovdidin.Û bo wilo
digotin:"Sê tişt hene bi serêş-mitirb û mirîşk û mêş.Çiqas ji
wanre bê here,her xwe didin pêş".

Belê,gava me berê bender didêran mitirb jî digeran.Dûvikê
dawî ji benderan,me jêre digot:"Dûvikê mitirban"ji beş,ku zû ji
kayê pak nedibû û tim mitirb digihane ser û dana xwe jê dibirin.
Mitirbê çav bi dûvikê dawî keta nema xwe ji dora benderan dida
alî,tanî dana xwe ber qefa xwe nekiriba.

Mirîşk jî weke mêşa,liber ba û tozê,sistin.Çêriya derve kêr
dikeve,lewra tim xwe davêjin hunduran bo ziyan û qezencan.

Toz û mêşên payizê çavan kul dikin,zarokan nexweş dixin. Ba
û bablîsokên wê benderan,ji hev,belavdikin û sefirnên xaniyan
liber xwe dibin û xiradikin.Barana wê jî axebanan piş dike.lê,
ji alîkî dinve,barana payizê pir bi xêr û bêre.Ji hêlekêve gers
û gemara,şûna çandiniyê,şîn tîne.Hingê çandini paqij çêdibe.Ji
hêleke dinve jî toz û gemara havînê dikuje û kesan agadar dike,
ku kar û bara xwe ya zivistanê bikin.Navên van baranan-payizxêre.
Nivîştî sala xweş-payizxêre.

Karê payizê jî pire û girane-cote,seyandine,bênderdêran û hi-
landine,tepişk û ka kişandine.....jî vê yekê hatiye gotin" Ez
bi kul û êşim!Ez xemkêşim!".

Çend gotin liser ziman û zimanê kurdî

Nivîskar :Sîpan

Ziman weke dara fêkiye.Çawa mirov guhnede darê,û li gora demsalan,çi gerek û pêwîste,ji bo jiyana wê neke,ew dikeve bin barê hişkbûnê,yan jî mirev ji fêkiyê wê bê par dimîne.Ne tenê bê par mayina fêkî yan windakirina belg û şaxan,lê demeke wisa tê,ku êdî dar pelan venake,şax jî roj bi roj ber bi hişkbûnêve diçin û hêdî hêdî ev nexweşî û xeterî xwa diberdin koka wê û berjêr dibin.Ziman jî di vî warîde wisaye.

Ev rewş,êdî terqînê ji dilê mirov tîne û li zengilê mirinê,ji bo jiyana wî jîndarî dixe.Lê hîna dema dawiyê nehatiye.Mirov li hember vê sekeratê(îskên mirinê)û mij û morana mirina wîde,nema kare bêje tev tiştên ji bo domandina jiyana wî gereke bêkirin, qediyane.

Riya xelaskirina(parastina)wî heyelwek çî?Wek zimanê me!Ne gereke,ku em gelek dûr herin.Di bîra me tê.Heta em dikarin bîjin,di van çend salên dawîde.Ma gele di bîra kê nayê,ku zimanê me jî ketibû koka xwe û êdî gur hatibû wî.Belg nemabû.Şax hişkdibûn.Lê,çi mabû?Rehên,bi dehên metran,ku xwe berdabûne nav axê û ew axa bi xêr û bêr,ku wek mertal ew parast heta roja me hat.Çî mabû?Kevnaretiya wî,ya ku rehên wî,ji nav sedsalên dîrokêve tîn.

Lê gereke em jîbîrnekin,ku ew dara ji mirinê hatiye parastin,û firo jî hatiye qonaxa hilberiyê,bê zehmetî û bê xwîdan gihîştîye vê qonaxê.Wek xebatên,di tev warandê tînkirin,çawa gav bi gav bi pêşde diçe heta digihe qonaxekê,xebata liser zimanê me jî,bi vî awayê çêbûye.

Bê goman,gelek neyên wê manê hene,ku tev tişt qediyaye.Ew hin serî deynin û destpêkê deynin.Carek gereke,ku em bi dilgermî,sipasî û giramiyên xwe ji wan kesanre pêşkêşbikin,ku li hember hişkbûna vê darê,bi rikoyî,sekinin û ew avdan û carek din bûne sebebê saxkirina vê dara xweş,ya ku em di vê kelej û germêde xwe didin ber siya wê û xwe diparêzin.Nedûre ku firo şaxên wê hîn tenikbin,lê ji bo mezinbûna wê keft û lefta tînkirin,em bi dilxweşî dibînin,kêf - xweşdibin û dilşadibin û pê serbilind dibin.

Ji bo çî bi wê em dilxweş û serbilind dibin?

Dema em li dîroka netewên gelek kevnarên,ku hebûn dinêrin,mirov dikare bêje;derveyî navên wan pêve tiştêkî wan nemaye.Gelek mîna - kiyay em dikarin liser netewên,ku firo bi yekcarî ji holê hatine rakirin bidin.Sedemên jî holê rakirina wan jî ewe,ku di pêvajoya dîrokîde nema karin zimanê xwe bidomînin.Her wek tê zanîn,mirov ji civakêre bikare bêje,gereke yekîtiya ziman hebe.Ev jî bûyerek bin-

gehiye. Em dibên netewê me ji vê qonaxa xeteriyê derbasbûye. Lê tev vatinîyên (wezîfe) me, li hember zimanê me hîn neqediyane.

Bi kêmasî, tiştên ji tev kesan gereke bê xwestin çine? Nema-ze, kesên ji xwere welatparêz, pêşverû dibêjin û ji bo xelasiyê keft û leftê dikin, çî dikarin bikin? Em dixwazin bidin xwuyakirin, ku xebata di riya zimande bêkirin, ne tenê ewe ku mirov nivîskarbe û binivîse. Gelek kar hene, dibe ku ji meve biqûk bê-ne xwuyakirin, lê em liser wan bipûnijin, gringiya wan di jiya-na zimande baş emê bibînin.

Îro kesekî ku salên wî çil û pêncin, em jê dixwazin bîst û pênc salan li paş xwe binêre û hinek liser bipûniye û birame. Bîst û pênc salan berî niha, kilam, bêritên ku di dawetande dihatin gotin, îro hêdî hêdî têne jibirkirin. Ez behwerim, ew kes dema bi şunde vegere û binêre û vê gotina me di bâr bîne, ji seda-sed wê liser vê gotinê, bi vî awayî, birame: "di bextê minde be ev camêr rast dibêje. Dema ez pazdeh salî bûm, bi kêmasî, min deh û heta bîst kelimên govendê jiber dizanin, lê îro ez dikim nakim şeş yan jî pênc ji wan nayên bîra min". Ez dixwazim, ne ew tenê, lê tev biramin û bipûnijin liser vê malxirabiya, ku me daye pêşiya xwe. Akam (netîce) yeke. Di vî warîde em tev yekin, ne kêr û ne zêde.

Belê gelî hevalan, ma ev tişteki gelekî girane, ku em nikarin pêkbînin. Yan em hîni tiştên giran (!) û mezin (!) bûne û bo tiştên hevqas "piqûk û sivik" re, seet û rojên me tejîne, û demên me yên vala tunene (!). Ez nebehwerim!

Ji bo hûn jî nebehwerin, dê fermo werin, em tev bi hev re, hilberiyên gelê me, yên çandî, pişeyî, zargotinî û h.w.d. çî hene em mil bidin milê hev, ji warê devkîde derînin. Û ji bo em wê dara, ku me ji germ û kelêjê diparêze bikin bi şax û pel, da xemla wê xweştir bibe.

Dawî

GRAMATIKA ZIMANÊ KURDÎ

(Ser Zaravê Kurmancî)

BONA KOMÊD V-VI

Nivîskar: Qenatê Kurdo

Guhertina: Xelatê

11. Xên ji navêd tiştêd ruhber û yêd neruhber zimanê kurdîda usa jî hene navêd usa, yêd ku naên hesabkirin ne navêd tiştêd ruhber, ne jî navêd neruhber. Ew nav her kîvî dîkin fikrekê.

Mesele:

hêrs, bîr, ruh, hiş, aqil, zên, fikir, derd, guman, hewar, xeber, pîrs, hîvî, cab, komek, ziman, zexan, nav, par, û gelege dinê.

1) Ji nav navêd jorîn hinek nav forma xwe ya hevbendî distînin pirtka "a", hinek jî forma xwe ya hevbendî distînin pirtka "ê".

a) Ew navêd, ku forma xwe distînin pirtka "a", ew xebitandin ser navêd cinsê mê.

Mesele:

hêrsa wî rabû, bîra te naê, fikra wî başe, gumana min heye, tu hîviya min be, caba min bide, komeka me bike, hewara me hat, xebera te raste, zêna wî zefe, pîrsa rast bihîst.

b) Ew navêd, ku forma xwe distînin pirtka "ê", tên xebitandin ser navêd cinsê nêr.

Mesele:

aqilê wî ji serî çû, derdê dilê xwe bîr nekir, ew hat ser hişê xwe, zimanê kurdî sivike, ruhê wî tune, navê te çîye? şerê me faşîstara giran bû, lê me alt kir.

12. Xên ji hemû navêd şirovekirî zimanê meda du cûre nav hene. Ew herdu cûre evin: 1) navêd fikra abstraktî û 2) navêd fikra kirinê.

a) Navêd fikra abstraktî ji aliyê forma xweda hatine çêkirinê bi arîkariya van pirtka "atî", "tî", "î", "ayî".

Mesele:

dijminatî, biratî, hevaltî, şivantî, serkarî, giranî, arzanî, bilindayî, dirêjayî, derbdarî, mervantî, û gelekê dinê.

b) Navêd fikra kirinê û bûyinê vî cûreine:

kirin, birin, mirin, kutan, hêran, qîjîn, girîn, gerîn, çinîn, çûyîn, bûyîn, şandin, standin, gotin, xwestin, hatin, ketin, firotin, kirîn, anîn, û gelekê dinê.

1) Ew herdu komêd nava yêd fikra abstraktî û yêd kirinê tên xebitandin her (tenê) ser navêd cinsê mê û forma xwe ya hevbendî distînin pirtka "a".

Mesele:

a) Biratiya milletêd welatê me qewîn û mehkem bûye, di jminayiya wan zûde hatiye hildanê; hevaltiya me helal, me terka şivantiya xwe kir; bi serkariya partiya bolşevika welatê me faşist alt kirin; arzanîya qîmetê nan dest pêkir sela 1945-da; bilidayiya stûnê deh mètre, derbdariya sosyalistiyê gumreh bûye, mervatiya te bîr nakin, giraniya bar çend pûte? cînartiya gundiye me başe, em komektiya hev dikin.

b) Kirina min; firotina nan; gotina te; hatina xort; çinîna gihîyê; kirîna kinca; nalîna birîndar; qijîna keçikê û gelekêd dinê.

RASTNÎVÎSANDÎNA XEBERÊD, KU AXIRIYA WAN BÎ SEWTA

"î"-VA TÊN LÊVKIRINÊ.

Di zimanê meda hene gelek xeberêd usa, yêd ku axiriya (kutasîya) wan bi sewta dengani "î"-vaatên lêvkirinê. Ew xeber evin:

a) Kanî, xanî, derî, kerî, sûrî, merî, carî, nêrî, bêrî.

b) Xweşî, reşî, başî, qencî, sorî, hûrî, xirabî, rastî, şirani, mêranî, piranî, berayî, sorayî, korayî.

v) Serkarî, derbdarî, şixulkarî, yari, dostî, dijminî.

g) Hevalti, birati, gunditi, hostati, nêçirvanti, cînarti, şivanti, rûviti, şerti.

Çaxê xeberêd ha di halê hevbendîda tên xebitandinê, hingê sewta nivdengani "î" gerek bê nivisandinê nîveka axiriya wan ("î") û formêd wan hevbendîda (a, ê), mesele:

a) Kanî, kaniya sar; xanî; xaniyê bilind; merî; meriyê me; carî; cariya Zîne; nêrî; nêriyê navpêz;

b) Xirabî; xirabiya wan; qenci; qenciya te; piranî; piraniya meriyê gund li gelê bûn; şirani; şiraniyê bûkê xwerin; mêranî; mêraniya wan.

v) Serkarî; serkariya partiyê; dostî; dostiya me; dijminayî; dijminayiya wan; yari; yariya wan.

2) Hevalti; hevaltiya komsomola; birati; Biratiya milletêd sosyalistiyê; cînarti; cînartiya gundiya, şivanti; şivantiya wan girane.

Nasî: 1. Xeberêd ha carna dinivîsin vî teherî: kanya sar, xanyê bilind û usa jî dinivîsin xeberêd, ku di bendêd "b", "v", "g"-da hatine nivisandinê. Nivisandina van xebra bi vî teherî ne raste. Xeberêd ha yêd ku bi sewta "î"-va kuta dibin, gerek di halê tewandîda bîn nivisandinê bi cûrê, ku min di bendêd "a", "b", "v", "g"-da nivîsîne (binêre jorê).

Nasî: 1. Xeberêd

2. Axiriya navêd ha, yêd jurê nivisandî, di halê tewandîde usa jî gelek sewta "y" nîveka "î" û forma tewandîde ("ê") bê nivisandinê, wekî xeber ser navê cînsî jin bin, mesele:

Koma hevaltiyê, şaxulê biratiyê; miletêd sosyalistiyê; ava kaniyê; kincê cariyê; dengê mêranîyê; xebata gundîtiyê; hacetê hostatiyê; partiyê komünistiyê; derbdariyê sosyalistiyê; lozûnga partiyê; peymana dostiyê û yêd dinê.

ÛRISÊTA PADŞEDA

Ûrisêta padşê girtîxana mileta bû. Berê Ûrisêtêda dijîan gelek milet. Halê hemû mileta têda xirab bû, lê halê pale û gundiyê neûris ji halê paie û gundiyê ûrisa xirabtir bû. Miletêd neûris di Ûrisêta padşêda bê extyar bûn. Zehmetkêşêd miletêd neûris di bin du nîrê stemkariyê (zulmiyê)-da bûn. Ew dihatin zêrandinê him bi destê muftexurêd wan, him jî bi destê milkar û kapitalistêd Ûrisêtê.

Padşatiyê (sarîzmê) medeniyeta miletêd Ûrisêtê difetisand, nedihîşt pêşda bibin edebiyet û hunuriya xwe. Vekirina mekteba, hînkirina zarua, neşirkirina kitêba û rojnama bi zimanê miletêd bindestî sarîzmê qedexe kiribû. Reata doranêd Ûrisêtê temam nexwendî bû. Mesele, di Azûrbêcanêda meriyê xwenda ji 10 selefa kêmtir bûn, di Qazaxistanêda her 2 selef xwenda hebûn, lê di Tacikistanêda meriyê xwenda qet tune bûn. Hebûn çend miletêd usa, yêd ku Ûrisêtêda nivîsar û elîfba wan tune bûn.

Sarîzmê (padşatiyê) û bûrjûaziyê didan sekinandinê pêşdaçûyîna malhebûna miletêd doranêd Ûrisêtê. Wana ji wêderê derdixistin hasileta xav û ne dihiştin li wêderê pêşda here sinhet û senaî û kûltûra wan. Padşatiyê û bûrjûaziyê kûr dikirin paşdamayîna Asiya navîn û ya miletêd din, yêd doranêd Ûrisêtê.

Dîwana padşê Ûrisêtê miletêd neûris didan şermê û sosretkirinê. Ewê bi destana şerê miletêd Ûrisêtê gur dikirin, û miletek berî miletê dinê dida, saz dikir palamarîya şihûda, ya hevkuştina teter û ermenîya, Seyasetîya xwegirtîya padşatiyê li Ûrisêtê dihat gotinê di van herdu xeberêd jêrîn: "ji hev biqetîne û dîwanîyê lê bike". Bi vê seyasetiyê dîwana padşê dixwest sist bike qewatêd zehmetkêşa, wana ji hev dûrxê û bike bin destê xwe.

Înglaba Oktyabira mezin hemû miletêd Ûrisêtê aza kirin ji vê zulmê. Naha hemû miletêd Sovêtstanê aliyê extyariyêda, palîtikêda û malhebûnê angorî hevîn, wekehev dixebitin di mala dostiyêda, şer dikin bona edilanîyê û çêkirina komünîzmê.

Spartin: 1) Vê qisa jorîn bixûnin!

2) Qisêda nişan bikin, kêdarê hatine xebitandinê navêd

abst:

abstraktî û mesder (navê kirinê û yêd bûyînê)?

PİRTKA YEKANÎ-NEKİVŞ.

13. Zimanê meda pirtkeke yekanî-nekivş heye. Ew pirtik tê hesabkirinê "ek". Eva pirtka ji jîmara "yênê" peyda bûna. Ji vê pirtkêra dibêjin pirtka yekanî-nekivş, çimkî eva pirtka carna kivş dike yekanîya tiştê, carna jî, çaxê kivş dike yekanîyê, hingê eyan nake ew yekanî kiye û çiyê, kivşnake ji piraniyê kîjan yekanîye.

1. Çaxê navêd tiştêd ruhber, yanê jî navêd tiştêd neruhber tên femkirin çawa navêd yekanî nekivş, hingê pirtka "ek" zêdehî ser kutabûna wan dibe.

Mesele:

Xort hat, xortek hat, jin çû, jinek çû, mêr ma, mêrek ma, berx çolê bû, berxek çolê bû, kevir ket, kewirek ket, mal ava bû, malek ava bû, kon hilşîya, konek hilşîya, gund li gelî bû, gundek li gelî bû, newal kûr bû, newalek kûr bû, min kitêb xwend, min kitêbek xwend.

Vêderê Ûi pirtka yekanî-nekivşva hatine xebitandin him(him) navêd cinsê nêr, hin(him) jî navêd cinsê mê.

2. Çaxê navêd cinsê mê tên xebitandin bi pirtka yekanî-nekivşva, hingê di cumla navada ew şûna pirtka "a" forma xwe ya hevbendî distînin pirtka "e".

Mesele: Jineke bedew hat maleke gund; bizineke topal paşda ma; qîzeke kurd mektebeke bilindda dixûne; Xudo kitêbeke zimanê kurmancî kirî; mêrgêne hêşîn pêşberî gundê meye, hespeke rind li mêrgê diçêrê; maleke teze li Tilîk saz bû, Traktoreke kolxoza me li zeviyê dixebite, keçkeke kurd traktorîsta.

3. Çaxê navêd cinsê nêr bê pirtka yekanî-nekivşva tên xebitandin, hingê ew di cumla navada şûna pirtka hevbendî "ê" forma xwe distînin pirtka "î",

Mesele: Korekî Reşîd li Moskvaê hîn dibe; Moskva şeherekî gelek mezine; xortekî kurd îsal înstîtûta hekimîyê li Êrêvanê xilaz kir; Fêza gundê me zinarekî bilind heye; cêrekî sor li milê keçkê bû; min kevrekî gulover gulol kir; birakî min beranekî me firot, hevalekî min serhatîk nivîsiye, çawa welatê me bi serkariya û pêşikariya partiya komûnîstiyê faşîst altkirin û sosîyalîzm çêkirine.

Nasî: Zimanê meda hene nav, ku axirîya wan tê gotin bi sewtêd dengani: "î", "a", "e" û yêd dinê.

Mesele: Nêrî, pale, bira, xanî, zarû, strî, rê û yêd dinê.

Çaxê pirtka yekanî-nekivş zêdehî kutbûna navêd ha dibe, hingê pirtka "ek" tê kurê kirinê.

Mesele: Nêrî hat, nêrîk hat; pale dixebite, palek dixebite; bira, birakî min li Lîningîradê hîn dibe; me xanî çêkir, me xanîk çêkir; zarû hat, zaruk hat.

Spartin: 4. a) Vê axavtinê bixûnin û ewê di deftera xweda binivîsin!

b)Şûna niqitka binivîsin pirtka yekani-nekiş("ek")!

Keç..rêda diçû;trakter..li zeviyê bû;jin..distrê;kelxozvan..
bûye fêrizê rênberiya sosyalistiyê;min xort..dît;kevr..gulol
bû;te kitêb..birê xwera kirî;mî..li çolê ma;beran..dikole;gund..
li wêderê bû;mêvan..dereng ket;ewî dar..li ber devê avê çikand;
çem..li deşta Êrêvanê dikişe;rex xaniyê nivisarîyêd Êrmenistanê
kom..şayrê û nivisazçiyêd kurda heye;di wê komêda dixebitin û
diefirînin nivisarçî û ulmdarêd me.

Spartin:5.a)Vê axavtina jêrîn bixunin û ewê di deftera xweda
binivîsin!

b)Şûna niqitka binivîsin forma hevbendî ya navêd
cinsê Mê("e")û ya navêd cinsê Nêr("î").

Rojek.biharê bû,em çûn ber çewek.avê;xûşkek.min li mêrgê bû,
ewê gulek çini û da hevalek.xwe.Lagêrek.pionêra li zozan bû,pî-
onêrek.aqil serkarê lagêrê bû,nîşanek.komsomolî li pêşira wî bû;
fêrizek.Sovêtistanê nemek.şayî pionêrara şandibû;em ber çema.kûr
sekinî,kenarek.wî bilind bû;zinarek.mezin ber avê bû;ji kura ku-
rek.biçûk ket avê;me masik biçûk avêda girt û bir malê.

14.Wextê navêd cinsê mê û yêd cinsê nêr di paşîya cumla nava-
da tên xebitandinê,higê formêd wan bi qanûn dîsa usa jî di hev
tên cudakirinê.

1)Çaxê navêd ser cinsê mê,bi pirtka yekani-nekişva di paşîya
cumla navada tê gotinê,hingê ew forma xwe hergav distînin pirtka
"ê":mala jinê,mala jinêkê,xebata malê,xebata malekê.

2)Çaxê cumla navada navêd ser cinsê nêr kûtasîyê tên xebitan-
dinê,higê formêd wan jî formêd navêd ser cinsê mê tên cudakirinê:

a)Çûrek navêd cinsê nêr çaxê bê pirtka yekani-nekiş di paşîya
cumla navada tên xebitandinê,hingê ew forma xwe naguhezî:mêrga
gund,stûna kon,dilê xort.

b)Çûrek navêd cinsê nêr jî çaxê bê pirtka yekani-nekiş di pa-
şîya cumla navada tên xebitandinê,hingê ew kokêva tên guhastînê(
sewta wan ya dengani tê guhastînê):serê gê(ga),kêleka dîwêr(dîwar),
derê xêni(xanî),kitêba birê(bira),dersa zimên(ziman),heqê şivan(şî-
van)û yêd dinê.

3)Çaxê herdu komêd navêd cinsê nêr bi pirtka yekani-nekişva di
paşîya cumla navada tên xebitandinê,hingê forma wan tê gotinê pir-
tka "î" .

Mesele:

a)Mala mêrekî,ava cêrekî,mêrga gundekî,stûna konekî,dilê xortekî.

b)serê gaki,kêleka dîwarekî,derê xanikî,kitêba birakî,dersa zi-
manekî,heqê şivanekî.

(Domayîk heye.)

CASIMÉ CALİL

KITÊBA KWENDÎNA LÎTERATÛRÊ

Bi zimannê kurmancî bona dersxana v-vi
Belavoka komara Ermenîstanê, Êrêvan 1955

Ji tîpên ezbuîki Jiyanê wergerandiye yên latîni,

+ + +

JÎ LÎTERATÛRA SOVÊTIYÊ

Berbi Gundê Kolxozvanîyê

Nivîskar: Cerdoyê Gêncî (1906-
1945)

-1-

Havîne taze destpêkiribû. Dest û zozanê Serhedê, gelî guhêra,
mêrg û çimana xeml û xêla xwe neşelandibûn, digul-gulîn.

Sibehekê em rabûn wisa sû, wekî taze kew ketibû, bajarê Êrêva-
nê di xewa şêrînde bû, bi tenê xirîna dengê tramva, ya ku hertim
wî wextî berî gişka silav li sikakê şimşatkirî dikir, kubar û
serbest, hevraz, berbi serê bajarê jorîn hildikişîyan, şûnde paşê
vedikişîyan, Egît û derbdarê zavot û fabrîka berjêr, berbi serê
bajarê jêrîn hildikişîyan.

Li wêderê, hun zanin çiqas fabrîka û zavot hene. Bi sirê, li pey-
hev, oh! hesab tune...

Gelo, kî ji we dîtibû bajarê Êrêvaniya berê? Eger te wan salên
paşîn neditibe, tu çaqas jî jîr û zanebe, çetine tu karibe naske...

Ew kirasê kevnî, hizhizî ji zûve ji xwe şeqitadiye, wêde avêtiye
û şeqitadiye.

Miha jîr xemiliye, sor girêdaye.

Koçik û sera, birc û bedena, gîgantê ejdeha serî dane ser hev bi-
lind weke çiya.

Bircên bedew, baxê torkirî, sikakê şimşat bi darê xemilî govend
girtine, tev dilîzin. Ohîdi wê govendêde hun zanin, çiqas egîtê derb-
dar hene... Bi ordiyê giran hezar-hezar, mêr û jin, qîz û xort...

-2-

Bû wîqe-wîqa otombîla me, dû li pey xwe kîre rêz, sikak sikak fi-
rqaşkir.

Çend deqa şûnde em jî bajar derbûn.

Otombîla me rûvekiribû, me çarnikarê xwe xweş didit, lê otombîla
me radibû û dikete ser rûbarê erdê, te digot qey wê hilpirike ezmên.

Şêlakê zpêce em çûn. Taze tevêde, pencê xwe kuta navsera çiya. Riya

me di wextê xwede riya du qûnaxa bû, lê niha deqa dijmêrin.

Cergên gundan ketibûn pêşiya me, hinek dinavre em derbasdibûn, hinek di kêlekêre.

Ji dûrve gundê ber pala çiyê zelal xuyadikirin: ci-cîna dÿyê tendûran bi qulbandin hevraz hildikişiya berbi ezmanê şîn, dinav bêde telp digirt, lihev beladibû û liser gund disekinî.

Li wêderê gîhadrûna (drûna geyê) gundê çiyaye, xebat li kewşenê sosyalistiyê dikele, egît û derbdarê kolxozê ra çarnîkar girtine, qîrîna xortane, şingîna kêlendiyaye, strana kolxozê ya hercar distrênin.

Otombîla me mîna birûskê diçû, di navbera seetekêde 60 kilomêtr rê me qutkiribûn, li pêşiya me welatekî taze vebû.

Em ser Aparanêde diqulibîn. Gundekî hêsa pervedaye, wisa çawa gundên me gelek ji wan bûne bi wî rengî, lê navê Aparanê di sedsalîyande hatiye gilîkirinê, gelek hêlê Êrmenîstanê û Zakavkazê, gelek navê gundê hev nizanin, lê ew tev bi hevre navê Aparanê rind dizanin, çimkî Aparan di wextê xwede gelekî şûndemayî, tariyêde bû, loma jî, gava ku gelek gund û bajarvanê Êrmenîstanê qehr û kêmasî dane serê hev, wan ev pîrsa hana wekilandine, "tu kurê Aparaniya, ne jî rekî, nezanî, serhişkî, sergedanî".

Hey gidî dema minî şiritî û zarotî, ev ew gunde yê ko nola qîza bi kurare liber mirada, lê ji nişkave di wextê xwede rûreş bûbû, kesî poz lê nedikir, jê hiz nedikir! Eve bajarê biçûçkî bedew çend salan pêşde gundekî kevnîk bû, lê niha, tu were binere, tê gelek neqş û nigarên delal bibîne.

Birc û bedenê wêderê jî serî dane serhev: karxana mermer, zavoda şîr, serşok, firna nan, aşlêjxana, mêvan xwene.

Çar-nîkarê gund darê baxa taze çikandine binî girtine, şînbûne, li hemberî aviyê diwanxana û qulixdara, di meydanêke pîr ferehde bi sirê dar nikandine. Baxekî seyranê wisa çêkirine, wekî mirov ji dilê xwere çêke û lê binere. Çi serê we neêşînim ez nizanîm kîjanê bêjim, çaxê rewş û pergale Aparanê didim.

Du deqa şûnde em li nava Aparanê bûn, liber deriyê diwanxana mezin.

Roja rihetiyê bû, lê diwan vekirî bû, wekî bîst mirovan liber deriyê bexçe taze sekinibûn, meslehet dikirin, du-sê xortan berî hev didan, yekî sêvek ji destê hevalê xwe revand, fêrqa dikir, ji nav wan derket, yê din dane pey, lê nikaribûn bigirtane. Xort çû dûr sekinî, desmala xwe ji berîka xwe derxist, sêva xwe paqîj kir, ji dûrve ban hevalê xwe dikir, wekî bibînin, pêş çavên wanve sêva xwe şêrîn-şêrîn da ber geza.

-We girte xwe, yekî ji wan got.

Li besta hêmbar weke deh-diwanzde xortan hespên hesinî li vî alî û wî alî wisa serbest diçerixandin, te digot qey ji zikmakîde liser piştê wan heşpa mezin bûne.

Liser milê rastê kêleka çem avayîke spî hebû, min berê xwe ji lîstîkê xorta guhest û li avayiyê temaşekir.

Avayî nepir mezin bû, lê rengê wê nîşandida wekî bi pêlên têknîka paşîn hatiya çêkirinê. Liber deriyê avayiyê wekî şeş-heft otombîl li peyhev sekinîbûn, di hundurwê avayiyêde çar goşê (anîşk) başqe-başqede sihet çêbûbû ji çar parçan, di sê fabrikade kes tunebû, tenê dezgê çêkiri, liser her dezgekî cûre-cûre hacet û pergalê hostatiyê temiz û tederust diberiqîn. Roja rihetiya wan bû.

Di her otaxa sinhetêde yek sîdoq du-dermanan dardekirîbûn.

Tenê ji sinhetxana çara şingîna çakûç û zindana dihat, gava ku em çûne hundur, karkeran tevan berê xwe dane min, silav li min kirin, min silava wan vegirt.

Fire-fîra kurma hedada bû, birûskên spî li vî alî û wî alî dipekiyan, xortekî serbest firaxek ji kurmê derxist, da ser zindan, du xortê din bi qiranê yek pûtê hatne nav çavên hesnê sorbûyî.

Ez nêzikî tenekçiya bûm.

-Hosta, vî wextî ewqas sobe çi hewale?

-Bona mektebêne; gereke em di wextekî kinde 250 sobe tewa bikin.

-250-î, ev çi hesabe? Hêla Aparanê 60-65 gunde, ewqas jî bere mektebên wan hebin, lê ewqas sobe? Me kêlikê henek bi hevdu kirin, û ez derketim çûm sûka Aparanê. Li wêderê gelek jin û mêr li hevdu digeriyan, çi bêjî neanîbûn; rûn, penêr, hingiv, hêk, mirîşk, savar, birinc, kinc û midas-sûk hatibû xemlandin, her gundekî kolxozvan-Ermenî, kurmanç, ecem hatibûn sûkê.

Kêfa min bi sûka Aparanêre dihat, ez dilihayî dimam, çimkî temenê Aparanê tevde min tiştên wisa taze nedîbûn, çimkî ez ji zûde neçûbûm Aparanê. Niha gundiyan, kolxozvanan riya dewlemendbûnê girtine, Ewana niha stûyê xwe liber kûlakan xwar nakin, ji wana cot û nîr na-xwazin. Ewana xwediyê keda xwene, xwediyê serbestî û azaya xwene.

+ + +
+ +
+

Gotinên pêşyan

- Rovî neçû qulê, hej bi dûvê xweve kir.
- Devê rovi negiha tirih, got: tirşe.
- Hê hesp nekirîne, alifan çêdikin.
- Riya dila biser dilade diçe.
- Civat li mala pîrêye û pîr li mala xelkêye.
- Mar ji pûngê dixulê, pûng liber qula mêr şin tê.
- Keçelo navê min li te, û kumê min li serê te.
- Dara mirov bi xwîna xwe av nede, berê şêrin nagire.
- Ne jina xeware, ne mêrê tirale.
- Ne jina kenok, û ne mêrê fihtok.
- Geya dibin kevirande namîne.
- Destê tirsoneka sînga spî nabîne.

+ + + + + + +

Mijûlayî

- *Eî kare sê caran liser hev bêje:
- Heft teşt tijî mast.
- Rovî li rê fitilî û rê li rovi fitilî.
- Çil çûk û çil maçûk û çil çêlî li wî rexî avê,
û çil çûk û çil maçûk û çil çêlî li wî rexî avê,
herçil çûk û çil maçûk û çil çêliyê wî rexî avê gotin:
Ma hun çend çûk û çend maçûk û çend çêlîne li wî rexî avê.
- Kerê boz li rizdê zirî.
- Mamê minî çeto ji wêve hat, tacek li serê wiye, tacê ji nav
taca tu çî tov tacî.

Mirov û energi

Amadekirina: Bilûrvan

Gotina "energi" iro gişt ji her kesîre nase. Tiştê bi gelemperi (giştî) nas ji ewe, ku em rastî gelek formên (rengên) enerjiyê tên. Enerjiya mîkanîkî ji mere pir nase. Em enerjiya mîkanîkî didin, dema ku em barekî hildin, yan dema ku em darekî bişkinin û wilo ji karên din, yê weke van.

Formeke din, ya enerjiyê germîye. Eger em bixwazin germbûna laşekî bihtir bikin-em bêjin, ya avê-dive em enerjiya germîyê bidnê. Iro em dizanin, ku germî bixwe enerjiya colaneyî (tevgerî, herekî) mîkanîkiye. Helbet ne colaneya makroskopîye (dariçav); ya laşên mezîni hişk, lê colaneya atom û molêkolane, ya mikroskopî (bi çavan naye dîtin) di laşande.

Hatiye naskirin, ku enerjiya mîkanîkî diguhere ya germî. Destên xwe gendê caran pev bixişiqîne, tê bibîne, ku germdibin. Lê guhertina wajî (berûpaşî, eksî), da enerjiya germî biguhere enerjiya mîkanîkî çetentîre (zehmîttîre, zortîre). Cara pêşî mirov enerjiya germî guherte ya mîkanîkî, berî çend dehsalan bû, ew jî dema makîna hilmê (makîna liser hilmê ava kelandî dimeşe) çêkir.

Forma enerjiyê, ya pir nas enerjiya ronahiyêye. Ne tenê destê mirov jê nabe, lê belê jî na her jiyandari û organîzmên din bê wê nabe. Roj wê forma enerjiyê dide. Helbet, mirov jî mêjve hînbû, bi pişkari (sinaî), wê forma enerjiyê derxe. Pêşî bi pêxistina agir, piştî jî çira, lampe û ta dema dawî jî neonên herî modêrn.

Forma enerjiyê, ya pir bikêrhatî, enerjiya elektirîkiye (kehrebai). Gişt bê windabûn dikare bête guhertin enerjiya mîkanîkî, yan germî. Pir hesanî tê guheztin deverên dûr.

Ji xeyn (pêvî) van formên jî, pir caran, liser enerjiya kimyayî û atomî peyv tên gotin. Ew ne texlîtne nû peydabûne. Ev herdu formên gegezîya (imkana) rêaksiyonên (tevkelnên) kimyayî û navika atomî, ku enerjiyê bidin, dide nîşankirin. Ji wê enerjiyêre, enerjiya potensyal (kmûnî), tê gotin.

Ku em bixwazin bi ferehî liser giranbîhabûna enerjiyê ji mirov re bipeyivin, dive pêşî bizanibin, ku hebûna jinê bixwe, her û her, girêdayîye bi dana enerjiyê. Organîzmê mirovî enerjiyê di forma wêyî kimyayîde (xwarin) distîne û diguhere forma mîkanîkî. Bi wê yekê hemû organên lêş dikarin bi karûbarên xwe rabin û dihêlin, ku karê fîzîkî pêk were. Eger mirov ti karî jî neke, dive enerjiya dike 2000 kalori jî xwarinê bistîne. Lê da mirov karibe bijî, dive li dor wî jî energi imbar kirî (texzînkirî) hebe.

Jiber ku energi pir pêwîste ji mirov re, dive zanibe wê derxe jî. Derxistin û xerckirina (biderdana) enerjiyê di van her dehsalên dawî de pir gelek bûye. Jiber wê yekê gera pey dîtina kehniyên enerjiyê

Jî bihtir bûye. Kehniyên energiyê yên ta niha liberdest: wek: kûmir petrol, enerjiya elektrîkî (kehreba) jî sîkrên ser çeman û y.m., di pêşroja nêzîkde têra mirov nema dikin. Jiber vê yekê jî dive mirov destbavêje kehniya nû, yên energiyê wek enerjiya rojê, yan enerjiya germî, ya navika Erdê (zemîne) û yan kehniya pir zengîn (têr) - enerjiya atomî.

Dawî

+ + + +
Behwerneke

Pêkanîna: Aro

Rojekê jî rojan kalekî sermeyandar derket bazarê, da sewîl, kûz û cêran jî xwere, bo av û rûn û hingiv, bikire. Sûka kûzker û cêrfiroşan tev û levda. Neqandin, veqetandin û bihayê wan hêdî-hêdî jimarî. Sewîl û kûz û cêrên xwe jî, yeka-yek xistin herdu ferên xurcîkê û dengêkî bakire barkêşan. Sê-çar barkêş li dora wî hatin hev. Heryek jî wan dixwaze têrê hilgire. Lê sermeyandar gotina xwe, bi dengêkî zelal, got: Ez bi kirê û pera barê xwe ranakim!

-Lê çawa dixwazî mamô-barkêşan got.

-Ez barê xwe bi sê şîretan radikim-kalê sermeyandar bersivda! Û yê bixwaze hilgire bila fermô bike!

Barkêşan bi seyr û temaşê li hev meyzandin. Lê barkêşekî, bi zênd û bend, xwe da ber rakirina barê wî bi hersê şîretan. Barkêş xurcîk rakir û li ser milan rastkir. Kalê sermeyandar jî bi rexket û rê pêşêkir. Bihnekê meşîn, gavek jî gavê dizîn û li şûn û şopa xwe nedinerîn. Barkêş milê xwe, dibin barde, hejand; bihneke kûr kişand. Kalê sermeyandar naskir, ku dixwaze şîreta pêşî bibihîze, lewre bi xwe bê pirs, got:

-Birazî, kî jî tere bêje, ku kesê binêr û yê destvala weke hevîn-behwerneke!

Barkêş bê deng, dibin barde, bi wîre meşî û bi şîreta pêşî mijûl dibû. Lê piştî çend-sed gavekî xwe negirt û got:

-Mamô, şîreta diduwa çiyê?

-Birazî, kî jî tere bêje, ku kesê siwar û yê peyade weke hevîn-behwerneke!

Şîreta diduwa jî weke ya pêşî nekete serê barkêşde, lê bédeng û rawestan gavên xwe, bi pêşde, avêtin. Hêviyên wî, tenha, bi şîreta dawîve mane girêdan. Sermeyandar jî ev hoşê û ramanên barkêş, di rengê meş û bédengiya wîre, dinasîn û didîtin, lewre şîreta sisiya hişte nêzîkî gihana malê. Wîlo meşîn tanî barkêş dîsa teqand û pirsî:

-Mamo, şîreta sisiya çiyê?

-Birazî, kî ji tere bêje, ku kesê têr û yê birçî weke hevîn-behwerneke!

Barkêş, hinga di şûnde rawesta, awirek dibin qoziya çavanre ji kalê sermeyandar veda. Milên xwe dibin ferên xurcîkêde hejandin. Destên xwe avêtin kevîka wê û diser serê xweve hilda û, ji hemî hêza xwe, avête xwar. Berê xwe da kalê sermeyandar û, bi nermî, got:

-Mamo, kî ji tere bêje, ku sewilak, kûzek, yan ji cêreki sax di xurcîkêde maye-behwerneke!

Dawî

+ + + +

Rovî-beranê kovî

Berhevkirina:Aro

Hebû şerek û hebû rovik;hebû gurek û hebû keroşkek;hebû hirçek û hebû kerek.Herşeq caneweran(heywanan)hev girtin û bi hev re çûne çiyê.Gotin:Emê herin xwe qelewbikin û vegerin malên xwe,Bi rêketin û qonaxek hilanin û yek danin.Bi rêde berf û baranê li wan dayê.Rê û rêbar windakirin.Çiya û newal jî şaşkirin.Pêrgî şikeftêkê hatin,Ketne mixarêde;ketne qulêde.Şûnê xwe riştin,çihê xwe miştin,û li ser dûvên xwe rûniştin.Roj buhûrtin,şev derbasbûn,lê berfê venekir û sermê kêmnekir.Tîbû, birçîbû;li hev nerîn,li hev meyzandin.Û gava awirên roviyê fenek li awirên şêr rasthatin,got: Birayê şêr!

-Belê, birayê rovi!

-Were em navê xwe ji hev re bêjin.Yê navê wî nexweşe, emê wî bi-xwin-te got çî?

-Birayê rovi min dizanî, ku tu yê şevên giranî....gotina te pir başe û şûngirtiye.Û wilo heryekî dest bi gotina navê xwe kir:Şêr : Ez şêrim, şêrê xwedême, xwedyê baxême.

Rovî: Ez rovîme, beranê kovîme. Devrûtîm, xwedî fen û fûtîm.

Gur: Ez gurîm, diran bivîrim, roja cengê tim hazîrim (amademe).

Keroşk: Ez keroşkim, kunveroşkim, berberoşkim.

Hirç: Ez hirçîm, laş bi pirçîm, devmezînim, terî kinîm.

Ker: Ez kerîm; kera aşame, xwedya barame.

Rovî got: Kera aş, xwedya bara çî navekî nexweşe. Şêr û canewerên din jî gotin raste, û ker xwarin.

Pêlek di wê navêre çû, rovi cardin got: Birayê şêr! Werin em navê xwe dîsa ji hev re bêjin, yê navê wî nexweşe emê wî bixwin. Şêr got: Başe, birayê rovi! Û navê xwe gotin.

Şêr: Ez şêrim, şêrê xwedême, xwedyê baxême.

Rovî: Ez rovîme, beranê kovîme, devrûtîm, xwedî fen û fûtîm.

Gur: Ez gurîm, diran bivîrim, roja cengê tim hazîrim.

Keroşk: Ez keroşkim, kunveroşkim, berberoşkim.

Hirç: Ez hirçîm, laş bi pirçîm, devmezînim, terî kinîm.

Rovî got: Hirça laş bi pirç, devmezînim, terî kin, navekî nexweşe! Şêr got raste, wilo hirç jî xwarin.

Piştî demeke din, dîsa navê xwe ji hev re gotin:

Şêr: Ez şêrim, şêrê xwedême, xwedyê baxême.

Rovî: Ez rovîme, beranê kovîme, Devrûtîm, xwedî fen û fûtîm.

Gur: Ez gurîm, diran bivîrim, roja cengê tim hazîrim.

Keroşk: Ez keroşkim, kunveroşkim, berberoşkim.

Rovî got: Kunveroşka berberoşk kesekî nebihîstîye. Wilo, ew jî, kirin gepek û xwarin.

Careke din, piştî birçûbûn, navê xwe ji hev re gotin:

Şêr: Ez şêrim, şêrê xwedê me, xwedî baxê me.

Rovî: Ez rovî me, beranê kovî me. Devrûtim, xwedî fen û fûtin.

Gur: Ez gurim, diran bivirim, roja cengê tim hazirim.

Rovî li şêr meyzand û got: Ha, birayê şêr! Ma tu çi dibêje? Şêr got: Birayê rovî, gurê diran bivir gelekî bi serê min nakeve! Wîlo gur jî xwarin. Mane şêr û rovî. Di şevreşêde rovî kire kirtê-kirt. Şêr pirsî: Çi kirt-kirta te ye, birayê rovî?

Rovî got: De bira, bi xwedê ez çavê xwe ji nêza dixwim! Şêr jî çavê xwe derxist û xwar.

Piştî ku êvar kerbû, şêr pirsî: Birakê rovî, ew çî ye tu dixwî?

Rovî bersiv da: Bira, ma ez çi bikim! Ez bi çavê mabûm, jina min nema qîma xwe bi min tanî! Min got ezê çavê din jî bixwim. Şêr jî lepek li çavê xwe yê din xist, ew derxist û xwar.

Wîlo, her şêr jî rovî dipirse: Çi kirm-kirma te ye, birayê rovî? Rovî bersiv dide: Ez destê xwe dixwim... destê din dixwim... lingê xwe dixwim... lingê din dixwim.... Şêr jî weke wî dike, tanî nema devê wî ghiştê laşê wî. Hinga, rovî ew jî xwar û ma bi teha xwe.

Zivistan çû, bihar hat. Rovî ji qulê derket, çav li tava biharê ket. Xwe li devê qulê veziland û kete xewa şêr in.

Bêrivanî hatin bêriyê. Dîtin vaye rovîkî xwe vemidandiye, bakirin: Gurzo, Beşo, Deqo, Belek, Hirço-wernêde!.. Gava rovî dengê wan kir, xapek da xwe û xwe xilaskir, û ji hingîve xwe, jiber segan, di qulande vedî-şêre, lê ta roja îro fen û fûtên xwe li caneweran dike, wîlo jî li şêra.

Dawî

+ + +

Sirinc:

Di rûpelê 28-de du rengên leystikan hatine. Kesê rengin din jî wan bizane, em hêvîdar in ku ji "Stêr" re pêşkêş bike.

Leystikên din jî, ku xwendevan liser wan bixwaze binivîse, hin jî wan, ev in:

-Kunsifre

-Çirê

-Kerkê dirêj

-Tûştê

-Garso pij î....y.d.

Hersê gotinên wamnisanê dibe, ku gelek ji me wan gotin nasdikin, lê mixabin ne hişik ji rol û naveroka (mezmun) nasnakin. Kašo darê leystika holê û gomakêye. Holê û gomak du leystikên me yê kevnare û serbixwene. Herdu leystik ji pir bi kefteleftin û bi lez û bezin. Herweha, leystikên me, yê kurdan weke wan pirin û zehfin. Min ji kalemêrekî kurd liser van leystikan pirsî, û bi taybetî liser hersê gotinên jorin, û kalemêr ev bersivda:

Kašo darê leystika holê û gomakêye. Serê dêr tewandiye û metreke dirêje, nemaze ligor dirêjbûna leystikvane. Darê kašo ji dara berûwê yan ji dara benikê (kizwanê) çêdikirin; û yê benikê çêtirbûn. Her leystikvanek kaşok-du kaşoyê wî hebûn. Ji xeynî kašo, destikekî din yê leystika holê û gomakê heye; goka dariye. Holê û gomak him leystikên zarokane û him yê mezinane. Leystikvan dibûne du bend. Hejmara her bendekê ligor pîrbûna leystikvanan bû. Car-carna her bendek ji den leystikvanan pêk dihat. Gotina me niha liser holêye, kalemêr berdewamkir, û got:


Her bendekê sînorek ji xwere datanî û nişandikir. Benda ku goka darî ji sînorê benda din derbasbikira, destdihiland û qezinc dikir. Helbet, bi kaşok goka darî jiber hev direvandin û berbi sînorê benda dijve dibirin. Katê leystikê negirêdayî bû, kat ligor jêhatbûna leystikvanan bû. Carna zû tewa dibû, carna domdikir. Ji alîkî dinve jî, kat bi dûrbûna sînoranve dihate girêdan. Leystika holê ne bitenê di yek gundêre pêkdihat. Gelek caran du gund dibûne du bend û bihevre dileystin. Wisa, gundek diçû ser gundekî, yan li konan êlek diçû ser êlekê. Çaxê gund diçû ser gund, nişana sînor dibû eqarê gund. Benda ku zora wê dihate birin û dihate bezandin, pezek-du pez ji leystikvanan serjêdikirin. Lîvir kalemêr gotina xwe liser holê guherte ser leystika gomakê.

Di gomakêde bend nînin. Her leystikvanek ji xwereye. Kortikekê li bêndereke fereh dikolin. Hejmara leystikvanan car-carna digiha deh-pazdehan; nebihtir. Goka darî dûrî kortalê deh-pazdeh gavan dihate danîn. Leystikvanan, liber kortalê bi sira, kaşoyên xwe davêtin gokê. Yê ku derba wî pîs diket, gok dibû maka wî. Derba baş, ya ku li gokê biketa. Leystikvanê gok bûbû maka wî, gerekbû gokê bi kašo nêzik bike û bêxe kortalê, da maka xwe tewa bike û leystik ji nûve destpêbike. Lê, karê leystikvanên din, ku rê nedinêde û gokê bi kaşoyên xwe dûrî kortalê bikin. Çareke din, da yê gok bûbû maka wî, da maka xwe tewa bike, ku bi kaşoyê xwe li yê gok revandî bide. Wîlo gok nema dimîne maka wî; hingî dibe maka yê bi kašo hatî dan. Katê leystikê ligor hewandina gokê û daxwaza leystikvanan kin û dirêj dibû. Eger zû hatibûna hewandin, leystikvanan ji nûve bi sira kaşoyên xwe davêtin gokê. Car-carna yê ku nikaribûna goka xwe bihewîne, leystikvanekî din maka wî jê dikirî û ken û tolaşên xwe bi leystikvanê makfiroş dikirin. Lîvir kalemêr keserek berda û peyva xwe tewakir .

NAVEROK

Babet	Rupel
- Pêşgotin	
- Çiyayên bi xwînê avdayî	1
- Bersıvdan	6
- Kurd û nêçîra Kewan	7
- Her hina	8
- Hevalê	9
- Ilmê turik	10
- Zanîna kalan	11
- Çend gotin liser ziman û zimanê kurdî	12
- Gramatîka zimanê kurdî	14
- Casimê Calî	19
- Gotinên pêşiyar	22
- Mirov û energî	23
- Bahwerneke	24
- Rovî - Beranê kovî	26
- Kaşo - Holê û Gomak	28

STÊR



A GENERAL CULTURE MAGAZINE

NUM. 3

YEAR 1983